ҚР Білім және Ғылым Министрлігі
Wezareta Komara Qazaxistanêye ulm û perwerdê

Prof. dr. Knyazê Îbrahîm

# Bername
## û mêtodîka hînbûna zimanê kurdî

*(Rêberîya mêtodîkîyê ji bo mamosteyên zimanê kurdî)*

**Bona dersxanê II-IX**

Almati - 2006

Şêwirdar:
H'esenê H'ecîsilêman - helbestvan, mamosteyê zimanê k'urdî.
H'esenê E'vdoyê E'lî - zanyarê zimanê k'urdî, doçênt.

*Bername ji bo dersdarê zimanê kurdî hatîye hazirkirinê, kîjan rêberîya mêtodîkîyê dide wan. Bernamêda usa jî saetê salewextê ser dersxana hatine parevekirinê. Kîjan kar û xebata dersdayîna zimanê kurdî hêsa dike, mecalê dide ku hînbûna zimanê kurdi bi cûrê mêtodê dersdayînêye nuhva bêne derbazkirinê.*

Ji alîyê Wezareta Komara Qazaxistanêye ulm û perwerdêda hatîye qebûlkirinê

(06 çile 2006, №6)

## Bername û mêtodîka hînbûna zimanê k'urdî

### *Bona dersxanêd II-IX*

#### PÊŞGOTİN

Ziman, e'debîyat û çanda k'urda wek dîroka gelê xwe kevnar û dewlemende. Ew dur' û cewahirê net'ewa me ji k'ûranîya qurna tên, ji elek û bêjînga sal û zemanaye giranr'a derbaz bûne, ji zara derbazî zara bûne, gihîştine r'ojên meye îroyîn. Şedetîya vê yekê usa jî bi dehan berhem û nivîsên dîrokzan, r'êwî û fîlosofê çîhanêye sedsalêd beriya Îsada jiyankirî di xebatê xweye granbahada didin. Ew cavkanîyê Çînê, Babîlistanê,Yûnanistanê, e'reb, faris û yên R'ojhilatêye navînin. Hele hê qurnên navînda helbestvan û r'onakbirên k'urdaye navdar E'lîê Herîrî, Meleyê Cizirî, Feqîyê Teyran, Meleyê Batê, E'h'medê Xanî û gelekêd mayîn derheqa hînbûn û giringîya zimanê k'urdîda fikrê p'ir qîmet mera hiştine. Seydayê mezin Eh'medê Xanî dîroka canda k'urdada ne ku t'enê helbestvan, hozan û fîlosofekî mezine, ew usa jî zimanzan û mamosteyê nemirîyê. Sala 1695-a ew destana (poêma) xweye "Mem û Zin" da derheqa hînbûna zimanê k'urdîda dinîvise. Sala 1685-a cara yekemîn ferh'enga xweye e'rebî-k'urdî (**"Nûbara biçûkan"**) dinîvise û medresa xweye şexsîda dersê dide zarokên k'urda. Lema jî seydayê mezin gotîye: *Min ev nivîsî ji bo sahîbrewacan, belkî ji bo biçûkên kurmancan"*.

Ew gotinên hozan û zanyarê k'urdî nemirî h'etanî îro jî k'emala xweye ulmî û fîlosofîyê hinda nekirine, çawa ku, t'emî û r'ênîşa hînbûna zimanê dê bîra medaye.

K'urdistan di zemanêd cuda-cudada jî alîyê zeftk'arêd der û hundur'da hatîye p'arçekirinê, pirsa hînbûna zimanê dê jî pêş gelek astengîyêd girane xedar sekinîye. Hebûn-tunebûna netewa k'urd hatîye înk'arkirinê, cîna jî axavtina bi zimanê k'urdî hatiye' qedexekirinê. K'urdistan her dem bûye pêşe'nîya de'w û doza miletîyê - azadarîyê. Ji ber van sîtemên pêşgotî bi h'ezaran k'urd asîmle bûn, zimanê dê bîr kirin, bûn "ewladê" dêmar'îya. Çawa kû kal û bavê me wextêda gotine: "Cavê derîya, xulî serîya". Ew gotina kal-bavê meye bi çîh, îro jî boy gelê me k'emala xwe unda nekiriye. Nenihêrî van astengîya, sedsalîyê dawîda li welatên cûda-cûdada kitêbên zimanê k'urdî bi tîpên e'rebî, latinî, kirîlî û ermenî r'onahî dîtine.

Dersdarê zimanê k'urdî gotî guhdarîke mezin bidine ser hînkirina tîpan, çawa ku em zanin wedekî dirêj - ji sala 1945-an h'etanî r'ojên îroyîn zarokên me ser e'sasên tîpên kîrîlî hînî zimanê dê bûne, îro jî ew li dibistana berdewam dikin. Ewa ne gelsi û kêmasîke, e'yane ku wexta şertê xweda ew elfabaya k'îrîlî gelekî kêrhatî û k'ardar bûye. Lê lazime binhêrin, ku r'oja îroyînda ewa yeka t'erê nake, çima ku p'areke alem û netewên başqe, îlahî jî p'iranîna gelê me xwendin û nivîsarên xwe derbazî tîpên latînî kirine. Gelê

k'urd jî zûda tîpên k'urdaye latînî şuxulandine û wexta em dîroka k'urdzanîye dinhêrin, vê derecêda k'eda mamosteye mezin Celadet Bedirxan begê bi şêkirandin bîr tînin.

Lazime bê gotinê ku, bona me k'urdên li welatê Sovêtêye berê (Qazaxistan, Rûsîya, Girgizistan, Ermenîstan, Gurcistan, Azerbaycan, Turk'menîstan) dijîn, derbazbûna tîpên latinî lazimîyeke ze'f mezine. Îlahî, di dereca helaqetîed navbera meye netewîyê, dîrok, e'debîyat û çandêda. Bi van herdu k'itêbên "Zimanê k'urdî" me armanc girt ku, vê kemasîyê derheqa xwendin û hînbûna zimanê dê bi tîpên latînî, nolî destpêkekêve jî, karibin derbazkin û bi alîk'ar'îya fikir û nêrînêd zanyar, nivîsk'ar, zimanzan û mamosteyên k'urd, feyde û zanîneke nuh bidine gelê xwe, ku hêjayê vê yekêye.

Divê, pêwîste, ku alîyê xwendek'ar û xwendevanan ev çend xalê jer gotî baş bêne zelal kirin û dîyar kirinê:

a) Ev cara pêşîne, ku pistî hilweşandina Sovyête li komara Qazaxstanê û welatêd yektîya Sovêta berê ji bo dibisatana k'itêbên zimanê k'urdî tê nivîsandinê. Ev jî ji bo me karekî gelekî giran, zeh'met û rûmete.

b) Zimanê k'urdî gelekî dewlemende - çend zaravê wî hene. Lazime bê gotinê, wekî h'etanî niha hê wek zimanekî netewî yekemîn nehatîye qebûlkirinê. Lema jî bi h'ezara xeber cuda-cuda têne axavtine, nivîsarê û fe'mkirinê.

Me ev p'irtûkana ji bo bêngavên (dersxanê) navîn û bilind (komê 2-5, 6-9) amedekir. Lê mirov dikare ji bo dibistanê yekşemî (voskresnîy) û xwe-xwe hînbûna zimanê k'urdî pêk bîne.

Me ji alîye hilbijartina kêrhatî: (naverok, ziman, pêdagojî û teknîkî) jî berpirsîyarî û cawdarî hilda ser milê xwe, van p'irtûkan cara yekemîn di tîpên latînî çap bikin.

Vê mijarêda me cûrê zaravê k'urdê Sovyêtêye berê (gotin, axavtin û hevserwextbûn) ji ber cavar'a derbaz kir, di alîye nivîsar û xandinêda qeyde-qanûne, ku elfaba k'urdîye kirîlîda hebûn, xayî kir.

| Bi elfaba latinî | Bi kirilî ev xeberana bê niqitk wusa têne xwendinê (ne raste) | Elfaba kirilîda (raste) | Tîpên latînida bi niqitik (raste) | Mînak |
|---|---|---|---|---|
| Çerm | Чәрм | Ч'әрм | Ç'erm | Ç'ermê ga |
| Çîk | Чик | Ч'ик | Ç'ik | Ç'ika ç'eva |
| Elî | Әли | Ә'ли | E'lî | E'lî hat |
| Heram | Һәрам | Һ'әрам | H'eram | Ev diravê h'eramin |
| Hub | Һöб | Һ'öб | H'ub | H'ub-h'izkirin |
| Kar | Кар | К'ар | K'ar | K'arê min heye |
| Kal | Кал | К'ал | K'al | K'al-zebeş |
| Par | Пар | П'ар | P'ar | P'ara min |
| Pire | Пьрә | П'рә | P'ire | P'ira mezin |
| Rûn | Рун | Р'ун | R'ûn | R'ûnê h'elandî |
| Text | Тәхт | Т'әхт | T'ext | T'extê nîn |
| Tac | Тащ | Т'ащ | T'ac | T'acê serê min |

# Пояснительная записка

## ( Методическая помощь для учителей курдского языка II – IX классов)

Объем, содержание и структура учебного предмета «Курдский язык» для средних общеобразовательных школ определяются с учетом, с одной стороны, цели обучения курдскому языку, диктуемой языковой политикой и языковой ситуацией в РК, с другой стороны, степени владения языком детьми перед поступлением в школу. По существующей традиции, высоким уровнем готовности к изучению курдского языка считается умение читать (пусть даже по слогам, но с пониманием прочитанного), считать до 10 в прямом и обратном порядке. Наряду с языковой готовностью учитываются и факторы неязыковой готовности - достаточный уровень развития познавательных процессов (мышления, памяти, внимания и т.д.), а также социальная и индивидуальная мотивированность изучения курдского языка.

Таким образом, традиционная система обучения курдскому языку предполагает, что еще до школы дети овладели начальными навыками письменной и устной речи, тогда, как и в Казахстане, старт не предполагает наличия обоих компонентов языковой готовности.

Поэтому в учебнике используется прием несинхронной подачи фонетики и графики в отличие от синхронного метода в традиционной системе обучения. Такое новшество продиктовано необходимостью устранения разрыва между устной и письменной речью учащихся, приступивших к изучению курдского языка. Оно предусматривает ускоренное обучение письму с использованием схожести элементов букв.

Для устранения разрыва между устной и письменной речью учащихся, только приступающих к изучению курдского языка, предусматривается ускоренное обучение письму на основе применения методики обучения по аналогии, опирающейся на схожесть элементов букв.

Языковой материал, который знакомит с графикой, связывается с фонетикой, представленной через систему согласных и гласных, через группировку согласных по признаку твердости- мягкости, через другие фонетические единицы, в частности, слоги.

Соотнесенность устной речи, имеющей звуковую оболочку, с письменной, имеющей графическую форму, отражается через описание соотношения звуков и букв, произнесенного и написанного слога, слова. В связи со звучащими словами вводится понятие об ударении.

Сокращение времени на изучение фонетики позволяет ввести новый раздел «Культура речи в общении». Этот раздел поможет усилить коммуникативную нацеленность обучения курдскому языку и, следовательно, повысить качество знания языка.

Структура учебного предмета перестроена для более рационального использования часов, отводимых на него.

Эти изменения осуществлены путем опоры на дедуктивный метод познания и путем использования модульного принципа обучения.

Дедуктивный метод познания определяет объединение тем в укрупненные смысловые блоки. Модульный принцип обучения делит языковой материал на модули, через которые обеспечивается его поэтапная, порционная подача.

Экономия времени за счет использования дедуктивного метода и модульного принципа позволяет расширить и углубить базовую языковую подготовку в начальной школе и выделить время для самостоятельной работы.

Необходимо при этом проводить обучение курдскому языку, систематически осуществляя принцип межпредметных связей, чтобы язык мог быть в полной мере использован в аккумулятивной функции, приобщая учащихся к духовному достоянию и ценностям, заложенным языке.

Предложенные методические установки раскрывают методы, принципы и приемы оригинального подхода к обучению курдскому языку, который позволяет сделать учебный процесс более эффективным по качественным и количественным параметрам.

Для оптимизации процесса обучения курдскому языку сделано следующее:

1. Синхронное изучение фонетики и графики заменено несинхронным. При освоении графики применяется принцип аналогии.
2. Эффективное использование времени на изучение курдского языка, его сокращение позволяет перестроить общий процесс начальной школьной подготовки. Курс начального обучения состоит из 2 этапов:

*1. Развитие устной речи при знакомстве с фонетикой и письменной речи - путем знакомства с графикой.*
*2. Развитие связанной письменной речи и совершенствование устной речи за счет изучения фонетики, орфографии, лексики, грамматики.*

Первый этап обучение грамоте длится 4 месяца (сентябрь - декабрь). За этот период необходимо развить фонематический слух, который будет являться основной для успешного овладения правописанием и беглым чтением, обучить первоначальному письму.

- Обучение грамоте носит развивающий и воспитывающий характер и слагается из трех взаимосвязанных процессов: обучение письму, знакомства с фонетикой и работой над развитием речи.
- Обучение письму осуществляется методом ускоренного письма, базирующего на принципе группировки букв на основе схожести элементов. Применение данного подхода позволяет значительно сократить сроки обучения письму, не снижая уровня качества обучения учащихся.
- Знакомство с особенностями фонетики происходит также на основе группировки букв и звуков по основным признакам. Вводятся такие понятия, как орфографическое и орфоэпическое произношение, устанавливается различие между ними. Ведется обучение звукобуквенному анализу слов.
- Важной составляющей уроков обучения грамоте является работа над развитием речи, направленная на развитие фонетического слуха, обогащение активного словаря учащихся, формирование умения точно и грамотно формулировать свою мысль.

Второй этап - освоение фонетики, лексики, грамматика, правописание и развитие речи.

Отличительной особенностью содержания раздела программы фонетика, лексика, грамматика, правописание и развитие речи является его расширение и углубление посредством следующих мероприятий:

. Укрупнения узловых тем в смысловые блоки, в результате чего высвобождается дополнительное время;

. Использование свободного времени для углубления тем, традиционных для начальной школы, и для введения новых тем, нетрадиционных для начальной школы.

К концу обучения учащиеся должны знать:

- синтаксис предложения с прямой речью (письменное обозначение прямой и косвенной речи);
- способы обогащения разговорной речи;
- правила и виды изложения; правила написания аннотации;
- жанровые особенности текстов- отзывов, рассказов-фантазий, юмористических рассказов, критических заметок, биографии и автобиографии, личного дневника;
- факторы развития общительности;
- виды общения;
- Этика общения как фактор его успешности:
- этические нормы общения в различных ситуациях;
- роль мимики и жестов в общении;

Уметь:

- правильно расставлять знаки препинания в предложениях с прямой речью, заменять прямую речь косвенной, передавать чужую речь;
- сравнивать, выявлять особенности разных стилей речи; использовать в своей речи (подготовленной) эпитеты, фразеологизмы, синонимы;
- писать изученные виды изложений, аннотации, отзывы, рассказы-фантазии, юмористические рассказы, критические заметки, различать биографию и автобиографию, вести личный дневник;
- различать изученные виды общения;
- соблюдать этические нормы общения.

## ŞİROVEKİRİN Û PÊŞDAYÎNÊN MÊTODÎKÎYÊ

Nêt û meremê hînkirina dersê zimanê k'urdî ewin ku zarok xwendin, nivîsar, dîrok, çand û vêjeya gelê xwe bi zimanê dê hînbin, e'rf-e'det, rabûn-rûniştandina gelê xwe bîr nekin. Di ruhê wanada h'ub û h'ezkirin, wê yekêra tevayî hunerê femkirin û şirovekirine, bedewatîya xeberdana baş cem wan bidin sewirandinê. Mîyaserkirina vî meremê di nav neh salên xwendinêda cawdarîya dersdarê zimanê k'urdî pêşda tîne wekî dersdayîn û hînbûna zimîn miqerim (rast) bidine teşkîlkirinê.

Dibistanên navînda gerekê guhdarîya mezin bidine ser dersê zimanê dê û wana usa bidine teşkîlkirinê, wekî xwendekar hînî gilîyê tezebin, wan dersê zimanê mayînra bidin girêdanê.

Lazime ku dersdarê zimanê k'urdî, bi alîkarîya hînbûna têkstêd welatparêzîyê, berhemên e'debîyata zargotî û klasîk h'ub û h'ezkirinê berbi welatê kal-bava û welatê ku têda dijî – Qazaxistanê pêşda bîne.

K'urd li Qazaxistanê ji sala 1937-da jîyan dikin. Dema welatê Şewrêda li Qazaxistanê dersê zimanê k'urdî dibistanada kêm dihatine derbazkirinê. Piştî hilweşandina Sovêtê (Dewleta Şêwrê) li Qazaxistanê ji boy pêşdaçûyîna çand û hunerê kêmnetewa mecal hatine sazkirinê. Îzin hate dayînê ku her netewek bikaribe ji boy pêşdaçûyîna ziman, dîrok, çand û hunerê gelê xwe navenda çandî veke.

Bi aqilbendîya sîyaseta prêzîdêntê komara Qazaxistanê N.A.Nazarbayêv sala 1995-an Assamblêya gelên Qazaxistanê (yekîtî û biratîya gelan) hate sazkirinê. Bi vê yekêva ji bo pêşdaçûyîna çand û hunerê gelan hemû mecal hatine sazkirinê, usa jî ji boy k'urdê Qazaxistanê.

Îro dibistanada cîkî mezin didine ser hînbûna zimanê dewletê (zimanê qazaxî). Zarokê k'urd jî bi zimanê qazaxî dixûnin, wek zimanê dê wî die'lîmînin. Çawa ku em zanin navbera zimanê k'urdî û qazaxîda ji alîyê rêzimanîyê gelek nêzîkayî hene, gelek xeber nolî hev têne nivîsandin û xwendinê. Mesele: **nan, pîvaz, qend, qurban, t'ext, e'yd, ruza, erzan, baha, yekşem, duşem...**

Xwendekar gerekê bi femdarî, rast û zelal qinyate, ku kitêbêda neşir bûne, bixûnin, têksta rast bi cûrê rênivîsa (dîktanta) binîvsin, derheqa qewmandinêd cuda-cudada ku nava emrê dibistanêda, xebatêda diqewimin, derheqa lîstikêd xweda û tiştêd ku bihîstine û xwendine qisekin.

Bernama dersdayîna zimanê k'urdî bona dersxanêd II-V- ji du p'arêd h'îmlî hatine sazkirinê:

1. **Xwendin û hînkirina xeberan.** Vê p'arêda hatine cî-warkirinê qinyatêd usa, ser hîmê k'îjana xwendek'ar gerekê hînî xwendinêbin û ferasetê pêşdabirina xeberdanê dest bînin, usa jî hînî ezberkirina û şirovekirina helbesta û xwendina qinyatêd ji dersxane derbin.

2. **Hînkirina qanûnêd r'êzimanîyêye (gramatîkîyê) pêşin û rast nivîsandinê, hînbûna sewta û tîpa.** Daxistina xebera ji sewta: bang û bedewnivîsara tîpa û xebera. Hînkirina wan xebera, yêd ku nivîsara wana ji gotina wan cuda dibe. Navê r'uh'bera, eşîya û nivîsara wan. Hînkirina hevbendê xebera û nîşandayina heleqetîyêd xebera hevbendada.

Berî destpêkirina hînbûna elfabayê lazime hema ji r'oja e'wlinda, ku xwendek'ar têne dibistanê, çi ku ew ber cavê xwe dibînin, karibin bêjin, gilîkin, hînî xeberêd

nûbin, hevokêd kurt çêkin: Dersdarê zimanê k'urdî gerekê meselê xeberaye usa bidine xebitandinê nava wanda tenê sewtêd usa hebin, k'îjana bi taybetî di elfaba k'urdîda çîh girtine. Mînak: *ç, ç', e', ê, h', î, k', p', r', ş, t', û.*

Guhdarîya xwendek'ara bidine ser wan sewt û tîpan. Dersdar usa jî gerekê guhdarîya xweye mezin bidine ser wê pirsê, wekî xwendek'ar hînî qanûnêd bedewnivîsarê jî bibin, wekî bikarbin xebera hevra bidine girêdanê, rast binîvsin. Eva yeka wê mecalê bide, wekî paşê xwendek'ar karibin kûrsa giramatîka zimanê k'urdî hêsa derbazbin, lema jî gerekê guhdarîya e'sas bidine ser şuxulê hînkirina qanûnêd giramatîkayê, kemala kîjana mezine.

Gava xwendek'ar destpê dikin e'frandinêd nivîsk'arêd meye klasîk û yêd naha, zargotina meye kevnar dixunin û şirovedikin, eva yeka nava wanda hewask'arîyê berbi xwendina edebîyata, bedewetîyê peşda tîne û xwendek'ar pêdih'esin, wekî zimanê k'urdî çiqas bedew û dewlemende. Xencî vê yekê, wedê xwendek'ar e'frandinêd nivîskara dixûnin û serecema wan şirovedikin, eva yeka alîkarîyê dide wan, wekî ewana bi zimanê wejayî (lîtêratûrî) rind xeberdin.Wê şûnda ewana pêdihesin, çika dor û berê wan, nava tebîyetê û cîyêd mayînda qewmandinêd çawa dibin. Mecaleke hînbûna zimîne baş ew yek hesab dibe, ku dersdar qinyatêd wejayêye mayîne hewaskar bona xwendinê teslîmî xwendek'ara dike. Gava xwendek'ar miqalê derheqa dinêzanbûnê, dîrokê û tiştêd mayîne hewask'arda dixûnin û şirovedikin, bi vê yekê ewana tebîyeta welatê mera dibine nas û pêdih'esin, wekî merivêd Qazaxistanê bi têxnîka wedê nahaye zorva sîlahbûyî guhestinêd çawaye mezin dikine nava emrê welêt, alîyê aborîyêda pêş dik'evin, çawa tebîyetê teslîmî xwe dikin û dewlemendbûna wê bona kara cimaetê didinê xebatê.

Lazime ku xwendin, şirovekirina serhatîya, miqalêd derheqa dinezanbûnê û yêd mayîn, usa jî şirovekirina şikila, dîtina kînoşikila dersê zimanê dinra bidine girêdanê. Gerek xwendek'ara t'imê bibine mûzêya, êkskûrsîya, nasîya wan bidine tiştêd dîrokîyêye kevn.

Gava bi vî cûreyê, bi praktîkî dersê zimanê dê hîn bikin bi wê yekê xwendinê emirra dididine girêdanê, xwendek'ar rind hazir dibin û nava wanda hezkirina berbi welat û gelê me pêşda tê.

Bernamêda hatîye kivşkirinê, wekî gava xwendek'ara hînî xwendin û nivîsarê dikin, gotî wana usa jî xebata xwendek'araye piraktîkra bidine girêdanê û hema bona wê yekê jî vê para bernamêda hatîye kivşkirinê, wekî ew miqalêd derheqa xebatêda bixûnin û şirovekin, herine êkskûrsîya, xebata deştê, zavod û fabrîkara bidine nas. Gotinêd kal û bavaye derheqa xebatêda baş hînbin.

Usa jî bernamêda hatîye k'ivşkirinê, wekî dersxanêd jêrînda temamîya kûrsa giramatîkayê derbaz nebin. Van dersxanada tenê nasîya xwendek'ara bidine qanûnêd gramatîkayê. Lazime xwendek'ara usa hînkin, wekî ewana bikaribin xebera rast binîvsin û bixûnin, hinek qanûnêd gramatîkayêra bibine nas, çawa mesele: **« sewt û tîp », « xeber », « hevok » û « pevgirêdana xebera »**. Dersxana 2-da, kuda ku destbi hînbûna zimanê k'urdî dibe, pirsa rastnivîsandinêye hîmlî gotî ewbe, wekî xwendek'ar zanibin kîngê tîpa mezin binîvsin, lê dersxanê sisîya û çarada gerekê nasîya şagirta bidine qanûnêd rastnivîsandina wan xebera, yêd ku bi sewta denganê destpê dibin. Bernamêda usa jî hatîye k'ivşkirinê, wekî nava sala xwendinêda her dersxanekêda gerekê hînî çiqas xeberabin.

Dersxana *dudada* xebata nivîsarê hîmlî wedê paşî hînbûna elfabê destpê dibe. Vî wedeyîda dersdar gerekê ji her çar sae'tê dersdayînê sae'tekê xwendek'ara xebata nivîsarêva bide mijûlkirinê û usa jî paşî her sae'tekê dersdayînê xebata malêye nivîsarê bispêre wana.

Dersxanê *sisîya* û *çarada* mehê carekê du sae't xebata testîqkirinê têne derbazkirinê. Gerekê ji h'esabê dersê xwendinê, giramatîkayê û rastnivîsandinê dersê xebata nivîsarê bêne derbazkirinê. Lazime xwendek'ara bere-bere hînî wê yekê bikin, wekî ewana bikaribin ji ber k'itêbê bigirin û binîvsin, cûrêd dîktantaye hesa, rast bêne derbazkirinê. Ji *dersxana IV* destpêkirî dersdar gerekê dersxanêda serhatîya û tiştêd bedewetîyêye mayîn bixûne, lê xwendek'ar derheqa wê yekêda binîvsin, yanê jî dersdar bi cûrê r'ênivîsa (dîktanta) tiştekê bixûne û şagirt binîvsin.

Berî derbazkirina xebata cêribandinê gerekê xwendek'ara usa hazirkin, wekî ewana bikarbin wê xebatê p'ak biqedînin.

Bernamêda hatîye kivşkirinê, wekî li *dersxanê II-IV* çiqas wext lazime ku ber k'itêbê bigirin, r'ênivîsa û nivîsara ji ber xwe binîvsin. Dersdar xwe-xwe dikare k'ivşke û usa jî bi xwestina xwe vê xebatê bide derbazkirinê.

Bona xwendina mijarêd (têk'st) ji dersxanê der nava mehekêda gerekê dersek bi vê nêtê bê derbazkirinê. Li dersxanêd II û III dersdar gerekê tiştê hewask'are rind ji k'itêbê bibijêrin û xwendek'arara bixûnin, lê dersxana IV gerekê xwendek'ar xwe-xwe derheqa mijarêd xwendîda şirovekin.

Bi h'esabe sae'têd ku p'arêd bernameye cuda-cudada hatine k'ivşkirinê dersdar dikare xwendek'ara hînî qanûnêd giramatîkayê û rastnivîsandinêye cuda-cuda bike.

# Pêşdayînên mêtodîkîyê

Bername

## Dersxana duda (72 sae't)

Şirovekirin

*Hînkirina tîpan (h'erfan), nivîsara xebera, xwendin, xeberdan û r'astnivîsandin*

Di k'itêba zimanê k'urdîye bona dersxanê duda û pêncada sê p'arê dersdayînêye h'îmlî hatine cîwarkirinê:

a) Hînbûna zimîn berî elfabayê.

b) Hînbûna tîpan, nivîsara wan. Çêkirina xeberan û hevbendê wan. Avakirina hevokan.

c) Hînbûna ziman piştî elfabayê.

**I. We'dê berî destpêkirina hînbûna elfabayê (4 sae't)**

Nêt û meremê vî we'deyî ewe ku zarok ji dersa e'wlin despêkirî xeberdana bi zar hîn bivin û wê xeberdanê pêş bixin. Pirsa bidine xwendek'ara û h'emû mecalên xeberdanê bie'frînin, wekî ewana karibin cawa pirsa rast bidin.

P'ara elfabayêyê pêşînda tîp bi şiklanva têne naskirine û hînkirinê. Vê demêda lazime zarokan hînî naskirin û nivîsara tîpan bikin.

1. **Elfaba k'urdî (Elfaba çîye?) (3 sae't)**
2. **Naskirin û nivîsara tîpan li ser şiklan ( 5 sae't)**
3. **Em dinîvsin û dixûnin ( 5 sae't)**
4. **Destnivîsara tîpan ( 5 sae't)**

Bi naskirin û hînbûna tîpan dersdar xwendek'ara hînî nivîsarê dike. Ji alîêd dersdarada lazime hînkirin û nivîsara tîpan bi k'emal bê derbazkirinê û we'de gelek neyê xerckirinê. Bona vê yekê bername ji dersdarê zimanê k'urdî tê xwestinê, kû ew k'îsî sae'tê kivşkirî usa jî mijarê dinêye hewesk'ar bide teşkîlkirinê. Wana hînî kilam, çîr'ok, zû-zûgotinok, têderxistinok, mesele û metelokê cimae'tê bike. Di wanda h'ub û h'ezkirina berbi zargotina gele meye dewlemend bide hizkirinê.

### II. Dengzanîn (fonêtîka) (27 sae't)

1. Organêd (endamêd) xeberdanê (2 sae't)
2. Koma sewtan (4 sae't)
3. Sewtên dengdêr (4 sae't)
4. Sewtên dengdar (5 sae't)
5. Derbdayîn (6 sae't)
6. Bang (heca) (6 sae't)

Cawdarîya dersdarê zimanê k'urdîye e'wlin ewe ku hela berî destpêbûna sala xwendinê bona teşkilkirina prosesa (h'alê) dersdayînê rind kar û tivdarekê xwe bike: k'itêbê xwendinê, elfabayê û bernama dersdayînera nasve, wana himberî hevke û ser hîmê zanebûna xweye miqe'rim bernama xweye xebatêye r'ojane û plana hale derse hazir bike. Xêncî vê yekê jî lazime ku dersdar zanibe, wekî zarok k'oma dudada hînî zimanê k'urdî dibin, piştî we yekê wexta ewana salekê hînî zimanê r'ûsî bûne û xweyê zanebûna zimanê t'omarîne, yêd ku bêguman ker tên û alikarîke mezin didin xwendek'ara bona bi k'emal û zû hînbûna elfaba k'urdî. Ji hînbûna zimanê r'ûsî û qazaxî zarok zanin, ku çîye sewt, çîye tîp, ewana zanin, wekî sewt têne gotin û bihîstinê, lê tîp têne nivîsar û xwendinê. Wekî xeber bi sewtava hevanin û hevok ji xeberan têne sazkirinê. Ewana zanin usa jî, wekî navê mirovan, çîyan, welatan behran û yêd din bi tîpê mezin têne nivîsarê.

Ev yeka bê gilî, k'arê dersdayîna zimanê k'urdî hêsa dike mecalê dide dersdara, wekî di nava wedê kinda gelek tîpan û qinyatê xwendinê derbazbe. Dersdarê zimanê k'urd'î alîk'arîke mezin usa jî ji vê yekê distîne, wekî dibistanada xwendek'ar zimanê k'urdîra t'evayî usa jî zimanê dereke (îngilisî, almani, fransi) derbaz dibin. Awa, eger dersdarê zimanê k'urdî xwendek'ara hînî tîpên zimanê k'urdîye: **e, e', h', i, u** bike û li ser wana 6-7 sae'tê dersdayîne xercke, bizanibe bona hînbûna tîpên **a, b, v, g, d** û yêd din gelek hindik wede lazime, bona wê yekê, ku xwendek'ara dersê zimanê îngilîsîda hînî nivîsar û xwendina wan tîpan dikin.

Bona we yeke jî anegorî mecala, dersdarê zimanê k'urdî dikare sae'tê dersdayînêda du tîpan hevra, derbazbe, lê we'dê elfaba ser kutakirinêye û xwendek'ar tîpên derbazbûyî rast û hêsayî dinivîsin û dixûnin, dersdar dikare sae'tekêda usa jî sê h'erfa derbazbe.

K'emala mîyaserkirina van peşdayîna ewe, ku ser hînkirina tîpên zimanê k'ûrdî dersdar 25 sae'ta zêdetir xerc neke û weke 10 sae'tê dersdayînê bihêvşîne, yêd ku paşwextîyêda alîk'arîya mezin we bidin bona daha pêşdabirina hînkirina xwendin û nivîsare.

Gava xwendek'ar hînî tîpa dibin, dersdar gerekê pêşîyê wana hînî k'omêd sewta û tîpa bikin, wekî ewana karibin xebera rast p'arevekin ser banga. Lazime pey hînbûna her tîpekêr'a xwendek'ar wan xebera bixûnin, yêd ku wana bi xwe, bi tîpên hejok çekirine û ser texte rêzkirine. Tîpên hejok çawa qinyatê hînkirinê k'areke mezin didin, wekî rind hînî xwendinê bikin. Lazime dersxanêda him tîpên hejokê biçûk û him ji tîpên hejokêye mezin hebin. Ewana bi cûrê elfabayê têne hazirkirinê û wana bi meqesê ji hevdu cuda dikin. Bi alîk'arîya elfabayê xwendek'ar gerek xebera ser banga parevekin û pey vê xebatêra hînî xwendinê bibin, wekî karibin xebera r'ast û zelal bixûnin û şirovekin.

### III. Hînbûna ziman piştî elfabayê (9 sae't)

Di vê p'arada xwendek'ar gerek morfologîyayê li ser hîme gilîyê kal-bava, mesele û meteloka, zû-zûgotinoka, têderxistinoka û yêd din hînbin. Pey hînbûna elfabayê lazime dersdar êkskûrsîya (gerê taybetî), dîtina kînoşikla û qisa derheqa van mijarada derbazkin: **«Zivistan»**, **«Bahar»**, **«Dibistan û mal»**, **«R'ojêd e'yda (cejna)»**, **«Heywanê malê»**. Dersdar lazime zarokara şiroveke, wekî zivistanê çi diqewime-r'oj sar û kinin, berf dibare, ava çema, cewa û gola diqerise. Pey zivistanêra gerek xwendekar derheqa baharêda şirovekin ku gava bahar tê û nîşanê wê çine, wekî baharê teyr vedigerin tên. Gundî destbi xebata malhebûna gundîtîyê dikin û pirsêd mayîn. Wexta baharê t'emamîya çîya û banîya, gelî û geboz, newal, deştên rast şîn dikin, hema vî heyamê baharêyî xweş gerekê xwendek'ara bibin bigerînin, nasîya wan bidine dor û berê dibistanê, her'ine parka gund (bajêr) maşîna û traktora, fermêd heywanet û cîyen mayîne hewask'ar. Derheqa h'eywanetê malê û beyanî (hov) - k'uvîda xwendek'arara şiroveke.

**Navnîşa wan e'frandina, ku xwendek'ar gerekê ezber bixûnin û hînbin (14 sae't).**

1. **R'ojên h'efta bi k'urdî.**
2. **Navên meha.**
3. **R'ozgarên salê.**
4. **Ber (qulbe) bi zimanê k'urdî.**
5. **H.Hecîsilêman «Dersdarê min».**
6. **Qazaxistan welatê meye**
7. **K'urdên Girgizistanê.**

### Dersxana sisîya (72 sae't)

### Xwendin û xeberdan

Dersxana sisîyada xwendek'ar gotî karibin rast û zelal bixûnin û serecema mijarên, ku p'irtûkêda hene şirovekin.

K'utasîya mijarada pirs hatine danînê, wekî xwendek'ar karibin cawa wan pirsa r'ast bidin. Lazime çend helbestên piçûk bidine xwendek'ara, ku ezberkin. Wexta dersdar bona vê nêtê helbesta t'eslîmî xwendekara dike, gerekê dersxanêda nêta wan helbesta kurt şiroveke, wekî xwendekar karibin paşê rind hînbin.

Bi alîk'arîya pirsa xwendek'ar gerekê derheqa mijarêd xwendîda û şiklên dîtîda şirovekin.

Derheqa êk'skûrsîya, e'mrê dibistanê, lîstikê xweda, xebatê, hevaltîyê, rozgarê salê û tebîyetêda, xwendek'ar gerekê aza gilî bike.

Mijar bona qisa û xwendinê (36 sae't)

Meremê vê p'arê ewe, wekî xwendek'ar daha rind hînî xwendina têkstê nivîsî û zargotinabin. Dersdar gerekê bi van mijara xwendek'arar'a dersa derbaz bikin:

Havîn. Zarok havînê hêsa dibin, karîya, p'incarê berav dikin. Kulîlka diçînin, dikine baq, avê xwedikin, alî de û bavê xwe dikin, diçine deştê alîk'arîya didine wan. Derheqa havînêda, wekî r'ojên wê germ xweşin, çayîr û çîman, çîya û banî, gelî û newal bi gul û sosinava dixemilin, gundî diçine zozana û derheqa tiştên mayînda gerekê qisa derbazkin.

Gerekê derheqa p'incarê, ku bostanada şîn dibin bê şirovekirine: mesele, derheqa we yekêda, wekî pamîdora, badimcana, gizêra, tivra, silqa, kartola, xeyala, pîvaza, lobîya, k'elema û yên mayîn bêcer dikin û çawa bikin, wekî bostanada ç'êre nelazim şîn neve û nehêlin, wekî ewana zirearê bigihînin wan.

Payîz. P'êwîste xwendek'arara şirovebikin, wekî payîzêda li deşta çi xebat tê kirinê, bajarada payîz çawa destpê dibe û tiştên mayin. Mijarên ku têda şikilê payîzêye bedew hatin dayînê û derheqa xebata payîzêda hatîye nivîsarê, t'eslîmî xwendek'ara bikin, ku ew bixûnin.

**Zivistan.** Têk'stên ku wanada şiklêd zivistanêye rind hatine dayînê û derheqa xebata zivistanêda hatîye nivîsarê, xwendek'arara bixûnin û miqalên hesîyay jî bispêrine wan. Gerek zanebûna xwendek'ara derheqa h'eywan û çivîkanda zêdekin û şagirtara bêjin, wekî zivistanê zarok gotî çi alîk'arîyê bidine çivîkan wekî ew nemirin.

**Bahar.** Têkstên ku wanada xemla baharêye kaw û bedew hatîye dayînê û derheqa xebata merivayê baharêda rind hatîye nivîsarê, xwendek'arara bixûnin, serhatîyê hêsîyay derheqa baharêda bispêrine wana, wekî malêda bixûnin. Gerek xwendek'arara derheqa daristananda qisekin û wanara şirovekin, wekî daristan çi k'arê dide meriva, ji dara çi tê hazirkirinê, wekî daristanada karî, êmîşê hov (beyanî) şîn dibin û gerekê çawa miqatî daristana bin.

Nasîya xwendek'arê *dersxana sisîya* bidine ser r'êjima saxlemîxayîkirinê, wanara derheqa çend pirsên sax'lemîyê şirovekin; xwendek'ar organîzma xwe çawa dikarin qewîn bikin?

**R'ojên cejnan.**

a) **R'oja serxwebûna komara Qazaxistanê.** Dersdar lazime, ku be'sa avakirina komara Qazaxistanê gilîke. Dema Sovêtêda û dû h'ilweşandina Sovêtera h'alê komarê çawa bû? Lê naha çewane? û yên dinê.

b) **R'oja cejna konsîtûsîya (qanûnnama e'sas) komara Qazaxistanê.** Desdar lazime, ku derheqa konsîtûsîya berê û nahada me'lûmatîyê bide. Navbera konsîtûsîya berê û nahada çi cudabûn heye? Derheqa extîyarî û mafê gelada qisekin.

c) *R'oja cejna bajarê Almatê* - gerek xwendek'arara derheqa dîroka çêkirina bajarê Almatê me'lûmatîye bidin, ku bajar k'engê û ji alîyê kêda hatîye avakirinê, navê wêyî berê çibûye û kenge bûye serbajarê Qazaxistanê, Almati r'ojêd îroyîn.

d) 8-ê **adarê - R'oja jinaye navnetewî.** Gerek dersdar derheqa h'alê jinaye berî şoreşa Oktyabira mezin, îlahî h'alê k'ulfeta k'urd xwendek'arar'a şirovekin û bi mesela bidine k'ivşê, wekî dewleta k'urda - komara Meh'ebatê extîyarîyên jina weke extîyarîyên mêra kirine. Ji boy pêşdabirina çand, huner, r'abûn-r'uniştin û pêşdabirina kûltûra gelê k'urd jin bûne qeweteke zor û mêrar'a t'evayî bi aktîvî tevî çêkirin û pêşdabirina komara k'urda bûne.

e) **1-ê Gulanê - R'oja yekitî û hevk'arîya gelê Qazaxistanê.** Lazime dersdar derheqa vê cejna yekitî û biratîya gelê Qazaxistanêda xwendek'arar'a şiroveke û bide k'ivşê, wekî Qazaxistan welatê h'emû gelane. Gelê Qazaxistanê hemû xwayîextîyarin.

g) **9-ê Gulanê - R'oja Altindarîyê.** Gerek dersdar xwendek'arara şiroveke, wekî merivên Sovetîya berê bi mêrxasî dijminê devxûn - zevtkarên Hîtlêrîyê altkirin û cimae'tên gelek welatên Awropayê ji bindestîya faşistîyê aza kirin.

h) **22 çile (1946-a) - R'oja avakirina komara Mehebatê.** Dersdar gereke derheqa avakirin û hilweşandina komara Mehebatêda me'lûmatîyê bide zaroka, di r'uh'ê wanda xastinêd welatp'arêzîyê pêşda bîne.

1. K'ilamên zaroka. Sala t'eze.
2. Li dersa zimanê k'urdî.
3. Fatma û T'êmir.
4. Li baxçê kulîlkan.
5. Li ber telêvîzyonê.
6. Şikoyê H'esen «Zimanê k'urdî».
7. Malbeta me.
8. Ez xwendekarim.
9. Hevalê min.
10. Xidirnevî.
11. Xort û kalê.

## Gramatîka (36 sae't)
## Morfologîya (formzanîn)

Xwendek'ar gerek elfaba k'urdî bi sirê ezber zanibin. Sewtên denganî û sewtên bêdenganî hevdu cudakin, r'astnivîsandina sewta «i» r'ast bidine xebatê, gotî bê şirovekirinê, wekî xeber, yanê jî bang ji sewta têne hûnanê.

1. **Wekilandinê mijarên koma II (6 sae't)**
2. **Çêbûna xebera (5 sae't).**
3. **Çêkirina xebera bi alîk'arîya paşpirtika (5 sae't).**
4. **.Çêkirina xebera bi alîk'arîya pêşpirtika (5 sae't).**
5. **Çêkirina xeberê hêsa (sade) (2 sae't)..**
6. **Çêkirina xeberê bargiranî (3 sae't).**

Ûsa ji lazime ku xwendek'arar'a şirovekin, wekî hevok ji xebera tê sazkirinê (çêkirinê). Xwendek'ar gotî bizanibin hevok parevedibin ser xebera, pey niqtênîşanê hevok bi tîpa mezin destpêdibe, lê k'utasîya hevokê gerek yanê niqitê daynin, yanê jî wexta hevok bi cûrê pirskirinê tê xwendinê nîşana pirsê (?) daynin. Hevokên heyholanêda nîşana heyholanê (gazîkirinê (!) daynin.

Xwendek'ar gerekê bikaribin hevokêda xeberên ûsa bibînin, yên kû cawa pirsa *k'ê? k'îjan? çawa? çi dike? k'îderê? çi cûreyî? bona çi?* didin, ûsa jî ew gerekê xwe-xwe hevokên kurt çêkin û pirsê jorgotî daynin.

**Dersxana sisîyada gotî xwendek'ara hînî van qinîyatê giramatîkayêye sade bikin:**

a. Mijar (têkst) belayî ser hevoke dibe, hevok belayî ser hevbendê xebera dibe, hevbendê xebera jî belayî ser xebera dibin.

b. Cûrê xebera:

Xeberê ku navê r'uh'berekî, yanê eşîyakî û qewimandinekê nîşan didin mesele: kar, golik, bizin, mişk, r'ûvî, canege, nogin, Mîrzo, Tîtal, Miraz, kevir, av, keşk, diz, sêl, k'ulfik, tendûr, dû, k'ulek, p'encere, derî, k'ursî, p'akî, qencî, t'emizayî, hevaltî)

Xeberê, ku dewsa nava tên xebate (cînav), mesele: ez, tu, ew, em, hûn, ew (ewana).

Xeberê ku fêl, kirin, bûyîn, yanê h'alê r'uh'berekî, ner'uh'berekî, qewimandinekê didin k'ivşê, mesele: hat, k'et, r'icifî, şûşt, nivîsî û yên mayîn.

Xeberêd nav û xeberêd cînav, wextê cumlêda çawa xudanfêl tên xebatê û cawa van pirsa didin: *k'ê? k'îjan (k'îjanî)? çi?* Lê xeberê, ku bûyîn, kirin û h'alê k'esekî, yan tiştekî didine kivşê, hevokêda cawa felgotî ev pirs raberî wan dibin, *çi dibe? çi dike?* Mînak: Tîtal dinivîse. Ez dixebitim. Van herdu cumlada xebered Tîtal, ez - xudanfêlin û cawa vê pirsê didin: K'ê? k'ê dinivîse, k'ê dixebite?

**Xeberêd: dinivîse, dixebite-fêlgotîne û cawa pirsa: çi dike? didin:Tîtal çi dike? ez çi dikim?**

## 7. Navder (îsîm) (10 sae't)

1. Navê heyînê anegorî fikir û nîşandayîna wane cisin, belayî ser k'oma dibin:

a) Navên nêrzayîn (mesele: nêrî, bav, dîk, ap, mêr, gur, beran, ga, Dirbo, Qaso, Ozman û yên mayîn).

b) Navên mêzayîn (mesele: mî, mirîşk, e'lok, çêlek, bizin, dê, jin, keç (qîz), bûk, xûşk, kevanî, Xecê, Zînê, Leylê, Werdek, Eyşê û yên mayîn).

c) Navêd qisma: dersdar - dersdara jin, dersdarê mêr; berx - berxê nêr, berxa mê.

Em r'ê têr'a dibînin, wekî li dersxanêd II-V bi hîmlî xwendek'ara qanûnên gramatîka zimanê k'urdîye sifter'a bikine nas, lê dersxanêd daha bilind- yen VI-IX qanûnên gramatîkayê yeko-yeko, daha k'ûr derbazbin, çawa ku di evê bernamêda hatîye k'ivşkirinê.

**Dersxana çara (72 sae't)**

**Xwendin û xeberdan**

Bi femdarî, r'ast û bi dengê bilind ç'îroka û têksta bixûnin. Çend helbesta û gilîyê kal-bava ezber bikin.

Ber xweva serhatîyên biçûk bixûnin û r'ast cawa pirsê dersdar bidin.

Gerekê xwendek'ar xeber û gotinên çetin r'ast şirovekin û nava xeberdana xweda wan xebera r'ast bidine xebetê.

Cawa pirsêd serecema qinîyatê xwendinê bidin. Xwendek'ar wextê helbesta, ç'îroka û têksta dixûnin, gerekê xwe-xwe karibin serecema qinyatên xwendî şirovekin.

Gotî xwendek'ara usa hîn bikin, wekî karibin nava xeberdanêda t'eqlê r'ast daynine ser xebera, zanibin wexta xwendinê gotî k'îderê hinekî bisekinin, bîna xwe bik'işînin.

Bi femdarî û bi hewask'arî nêta têksta, helbesta, ç'îrok û serhatîya şirovekin, serecema wan şikla qisekin, yêd ku nava qinyatê kitêbêda hene (ser h'îmê pirsêd dersdar).

Derheqa çi ku nava e'mrê dibistanêda diqewime, listikê xwe, bajar û gunda, civatêd xwendekara, cejna û tiştêd mayînda xwendek'ar gotî k'ar bînin û şirove bikin.

**Gramatîka (36 sae't)**

1. **Cînav (8 sae't)**
2. **Formêd halên nava (12 sae't)**
3. **Gotinên wekhev (3 sae't)**
4. **Gotinên hemtîpî (3 sae't)**
5. **Gotinên dijraber (3 sae't)**
6. **Curên pirsan (7 sae't)**

**Mijarên bona xwendin û qisekirinê (36 sae't)**

1. E'lî û Fatîme fekîyan dikirin.
2. Dûmeqesk. Berxvano.
3. Du heval.

4. Adrês pirsîn.
5. Zivistan.
6. Dilê dayîkê.
7. K'ilamê govendê.
8. Tû jî heqî...
9. Cix'are merivan dukuje.
10. Ardû çî mer'ane?
11. Name.
12. Kurê bêxîret.
13. Pirs û bersiv.
14. Ez û tebîyet.
15. Hevaltîya gur, rûvî û hirçê.
16. Kesera teyr. Silêman û Têlman.
17. Jina nandar.
18. Sîr û hingiv hev nakin.
19. E'lîyê Evdilrehman. «Rewşa jina k'urd».
20. Xwestek yeke, ziman cuda.
21. M.Reşîd «Weten».
22. H'ezkirina çivîkan.
23. Hevnasî. Sae't. Sae't çende?

## Dersxana pênca (72 sae't)

### Pêşgotin

Xwendek'ar gerekê e'frandinêd bedewetîyê, serhatîya û miqalêd mayîne dîrokîyê, yêd ku bi serecema xweva û alîyê zimanda ne haqas çetinin bixûnin.

Baş dibe e'frandinê bedewetîyê, serhatîyê biç'ûk û nivîsarêd mayîn ezber bikin, yêd ku terbîyetkirina xwendek'arara girêdayîne. Zarok gotî wana dersxanêda, êvarîya û cîyêd mayînda bêjin.

Xebera û mesela nava gotinada r'ast bidine xebatê. Xwendek'ar gerekê serecema t'êk'stê, ku ew dixûnin, r'ast şirovekin.

Serhatîya, miqalêd bedewatîyê hesîyayî û biç'ûk, yêd ku serecema xweva ferzin, gotî ser dereca p'arevekin, wekî xwendek'ar karibin derheqa wanda binivîsin, bi alîk'arîya dersdara û pêy analîzkirina serecemê.

Bi k'omekdarîya dersdara xwendek'ar gerekê xebernamêd (ferhengêd) biç'ûk jî deftera xweda binîvsin. Xeberêd t'ezeye nenas, ku t'êkstada r'astî wan tên,nava xebernamêda (ferhengêda) binivîsin û dema nivîsarê cîda bidine xebatê.

Nava t'êkstêd e'debîyatêda navê heyînê û xeysetnava bibînin û qanûnêd giramatîkayêye mayîne derbazbûyî bînine bîra xwe.

Xwendek'ar gerekê karibe pey xwendina ç'îrok û t'êkstêd bedewatîyêra bi k'omekdarîya dersdar plana xebata xweye nivîsarê çêke û ser hîmê wê planê serhatîyêd biçûk û mezin binivîse û dersxanêda bixûne.

Xencî wê yêkê plan gerekê k'omekê bide xwendek'ara, wekî ewana serecema têkstê xwendî bi xeberêd xwe şirovekin.

Xwendek'ar gerekê karibin pey t'emaşekirina şiklêd cuda-cudar'a serhatîyêd kurt binîvsin û qisekin.

R'êzimanî

**Dersxana pêncada ji 72 sae'tê dersdayînêye kivşkirî pêwîste 38 sae't ser dersdayîna giramatîkayê bêne xerckirinê:**

1. Bona wek'ilandina qinîyatêd ku dersxana çarada derbazdibin - 3 sae't
2. Wekilandina qinyatêd derbazbûyî li k'utasîya salê - sae'tek

Bona hînkirina giramatîkayê dersxana pêncada gerekê alîyê dersdarada ev p'arêd k'itêbêye bona dersxanêd II-V bêne hînkirinê û şirovekirinê:

**Gramatîka (36 sae't)**

**P'ara fonêtîkayê (4 sae't)**

1. **Hoker (zerf) - (7 sae't)**
2. **Bernav (edat) - (3 sae't)**
3. **R'engder (xeysenav) - (4 sae't)**
4. **Rastnivîsara jimaran - (4 sae't)**
5. **Lêk'er - (4 sae't)**
6. **R'ader (mesder) - (6 sae't)**
7. **Sîntaksîs (Ristesazî). Hevok - (4 sae't)**

**Mijarên bona xwendin û qisekirinê (36 sae't)**

1. **Mecîdê Silêmîn. «K'urdistan». Mar û r'ûvî.**
2. **Çand û dîroka me hebûna meye.**
3. **Îskender û Dîyojên. Bûk û stûn.**
4. **Cegerxwîn. Zir'a k'erê, lota devê.**
5. **Heqî wunda nabe.**
6. **Xeberdana pê têlêfonê.**
7. **Mijûlîyê cimaetê.**
8. **Bavê Nazîr «Çarîn».**
9. **Dîyar ji xewê hişyar dibe.**
10. **Îsmaîl û Îbrahîm.**
11. **Cemê gundê me. Masîyê gavanozê.**
12. **Sivorî zaroka hez dikin.**

13. Hevalê min tê mala me mêvanî.
14. Min newroz cawa nas kir.
15. Kulîlka min. R'ojbûyîna te kîngêye?
16. Dîk, keresû (reşêlek), werdek û rûvî.
17. Diz û melle. Axê min bû bostan.
18. Ha gulgulî, gulgulî...
19. K'oşk û sera xwendekara.
20. Meriv û mar.
21. K'ulma melle.
22. Biratîya quling û rûvî.
23. Ji zargotina gelê me.
24. Pêkenok.
25. Kusî û rûvî.
26. Bizin û karikê wê.

## Dersxana şeşa (72 sae't)

### Pêşgotin

Dersxana şeşada xwendek'ar gerekê karibin serhatîya derheqa pirsêd çand û dîrokîyê, dinêzanebûnê û t'ebîyetê bixûnin.

Xwendek'ar gerekê karibin xeberêd t'eze hînbûyî (nû) r'ast bidine xebatê, nêt û serecema qinyatêd xwendî r'ast şirovekin. Cawa wan pirsa bidin, yêd ku analîzkirina (lek'olînkirina) serecema qinîyatên xwendîra girêdayînê.

Xêncî r'ast şirovekina têkstêd xwendî, xwendek'ar gerekê bikaribin derheqa ger'ê, seyranê û dîtinêd mayînda bi curekî bedew qisekin.

Ser h'îmê pirs û cawa, pilana çêkirî, xwendek'ar gerekê serhatîyêd biç'ûk derheqa tiştêd xwendîda û dîtîda binivîsin. Dersdar dikarin şiklekî nîşanî xwendek'ara bikin, serecema wî wanara şirovekin û paşê bispêrine xwendekara, wekî derheqa wî şiklê dîtîda serhatîke biç'ûk binivîsin.

Xwendek'arêd dersxana şeşa gerekê bikaribin bê şaşî bi destnivîsareke bedew nema, erzê biç'ûk û e'lametîya, miqala bona r'ojnema dibistanêye dîwêr binivîsin.

Xwendek'ar gerekê nava têkstada navêd jimara bivîne û bêje, ji wana k'îjan jimara çiqasîye, k'îjan jimara çarkirî û cêrgekirîye. Wana ji hevdu cudake û bêje cawa jimar têne guhestinê. R'astnivîsara jimara zanibe.

Xwendek'ar gerekê bikaribe di nava têkstêda ûsa jî lêkera bibîne, r'astnivîsandina wana zanibe, gotî serecema serhatîyêd ku xwendîye, qiseke, binivîse û qanûnêd r'astnivîsandinê r'ast bide xebatê.

Xwendek'ar nasîya xwe bide wan xebera, yêd ku bi nivîsar û axavtinê ji hevdu tême cudakirinê.

**R'êzimanî**

Zanebûnêd xwendek'ara derheqa qinîyatên gramatîkayê û r'astnivîsandinêda, yêd ku wana dersxana sisîyada destanîne, gerekê dersxana çarada hinekî k'ûrbin, bi cûrê xeberdana zargotî, xwendina têkstêd lîtêratûrayêye (wêjayêye) h'emcaw û bi alîk'arîya sipartina xebata nivîsar (çawa dersxanêda, ûsa jî malda) baş bêne me'handin û k'ûrkirinê. Bona vê yekê, çi ku zarok dersxanê derbazbûyîda derheqa sewt, bang, xeber û hevokanda, ûsa jî derheqa cûrê xebera li hevokada, r'astnivîsandina xeberdan û pirsêd gramatîkayêye mayînda derbaz bûne, gerekê bê wek'ilandinê.

Wekilandina dersêd derbazbûyî, ûsa jî şirovekirin û sipartina qinîyatê gramatîkayêye t'eze, çawa dersxanê dida, usa jî vê dersxanêda gerekê xwendin û analîzkirina (lêkolînkirina) tekstêd h'emcawr'a bê girêdan. Dersdar dersxanêda xwendek'arara têkstêd bijartî dixûne, bi pirsê xwe û çawa xwendek'ara van têksta şirove dike:

**1. T'êkstêda çend hevok hene?**

**2. Cûr'ê hevoka anegorî xeysetê wan:**

**a) Hevoka qisekirinê.**

**b) Hevoka pirskirinê.**

**c) Hevoka heyholanê.**

**3. Cûr'ê hevoka anegorî libsê wan.**

a) Hevoka hêsîyayî, yêd ku bi xeberekê, yanê jî du-sê xebera çêbûne (Havînê. Ez dinivîsim. Fatma nan dipêje. Leylê avê tîne.)

b) Hevokên bargiranî, yêd ku ji du hevokan zêdetir hatine çêkirinê. (Xezal pez didoşe, Medîne jî k'inca dişo. Qasim k'itêbê dixûne, lê E'lo berxa diç'êrîne.)

4. P'arêd hevokêye sereke (fêlgotî û xudanfêl). Fêlxwaz çawa p'ara hevokêye ne sereke (Ew nan dipêje).

5. Xebitandina xeberêd xeysetnav li hevokêda, yanê hevbenda xeberada **(xwendek'arê baş, h'ubra şîn, ava sar, berfa belekîya, p'incara t'eze).**

1. Xeberêd li hevokêda hatine xebatê ji sewta hatine hûnandinê. C'ur'ê sewta, sewta dengdêr, sewta dengdar.

2. Xebitandina xeberêd bernav hevokêda (ber, ser, li, cem: ber avê, ser gund, li malê, cem Mîro).

3. R'astnivîsandina wan xebera, yêd ku k'utasîya wan bi sewta dengdêr xilaz dibe (gundî-gundîya, masî-masîya, sî-sîyê, mî-mîyê).

**Gramatîka (36 sae't).**

**Sînt'aksîs (R'istesazî)**

1. **Curê hevokê. Hevoka sade.**
2. **Hevokên navan yên têkelî.**
3. **Hevokên r'ezik (giran).**

4. Hevokên pirsê.
5. Hevokên fermanî.

Mijarêd bona xwendinê û qisekirinê (36 sae't)

1. Komara meye h'ezkirî.
2. Mala Nazê. Neferê malê.
3. R'asthatin. E'lî Herirî.
4. Çîyayê Agirî. Amed.
5. Bajarê Agirîyê.
6. Em qewm û lêzimê xwe nas bikin. Mezinê me.
7. K'îne em? Xebata ser şikla.
8. Hevnaskirin.
9. Melayê Cizîrî. Li sûkê.
10. Salhê Heso "Namûse ziman".
11. H. Hecîsilêman. "K'urdistan".
12. Selahedîn Eyûbî. Xebata ser şikla.
13. Seyrangehê golên Almatê. Li seyrangehê.
14. Feqîyê Teyran. "Dîlber".
15. Abay Kûnanbayêv. Name ji daykêra...
16. Hovhanês Tûmanyan. "Zevtkirina kela Timikê".
17. Mamosteyên me. Sirsûn (nehêre).
18. Li ber bilêtgehê. Li ber tirênê.
19. Xewa zarokan. K'ar li ser şikilan.
20. Melayê Batê. Req, masî û sûravêlk.
21. Almati . Xebat ser şikla.
22. Bajarê Çîmkentê. Li dik'anê.
23. Li xarinxanê. Ferîde cilan dik'ire. Xebat ser şiklan.
24. Gundê me. Omer Xeyam.
25. Mûxtar Aûêzov.
26. Melle Mustefa Barzanî. Padişah û gundî.
27. Bajarê Duhokê. Astana.
28. Bajarên Başûrê r'ojavayê K'urdistanê. Li ûnîversîtêta doxtirîyê.
29. K'eda helal. Li doxtirxanê.

## Dersxana h'evta (72 sae't)

### Pêşgotin

Xwendek'arê dersxana h'evta gerekê têkstêd e'debîyata bedewetîyê, mqalêd seyasetîyê û ulmîye berbiç'ev bê şaşî, r'ind bixûnin: bi zimanê k'urdîyî wejayî serecema têk'stêd xwendî şirovekin, çi guhestinêd t'ezeye berbiçev, yêd ku nava e'mrê dibistanê, gund û e'mrê mexlûqetîyêda diqewimin, dersxanêda şirovekin.

Ji k'itêbê çend têksta bispêrine xwendek'ara, wekî ew bixûnin, xwera planê çêkin û li ser h'îmê we planê xebata nivîsarê dersxanêda derbazkin. Derheqa k'itêbêd xwendîda şirovekirinê biç'ûk û miqala binivîsîn.

Dersdar çend xebera dibêje, lê xwendek'ar gerekê ji wan xebera hevoken alîyê giramatîkêda r'ast çêke û bêje.

Nava t'êkstanda xwendek'ar gerekê hevokêd dirêj û kurt bibîne, bêje, wekî k'îjan xeber, p'arêd hevokêye serek'ene û k'îjan ne serek'ene.

Nava t'êkstada fêlgotî, bernav û pevgirka bivînin û r'astnivîsandina wan zanibin.

### Gramatîka (36 sae't)

1. **Curê hevokê (wekilandin) (6 sae't).**
2. **Lêker (6 sae't).**
3. **Zemanên lêkeran (24 sae't).**

### Mijarên bona qisekirinê (36 sae't)

1. **Cegerxwîn.**
2. **Silêmanî. Xebat ser şiklan**
3. **Abay. Xebera yekê.**
4. **Hewlêr. Welat.**
5. **Î. Bûnîn «Cahaltî û ahaltî».**
6. **Osman Sebrî. "Halê welat".**
7. **Şeref li balafirê.**
8. **R'oja dayîka. K'er û ga. Dizê fêlbaz.**
9. **Pirs û bersiv. Tîtal li berberxanê.**
10. **Zimanê cihanê û k'urdî. Fîlm.**
11. **K'irmanşah. Nado bilêtê dik'ire.**
12. **Şamîl Eskerov. Xebat ser şikla.**
13. **Zargotina k'urda. Yê ku hêkê bidize. Du bizin.**
14. **Rêwî û nêrî. Xeyda devê.**
15. **Qedrîcan .**
16. **Wezîrê Nadirî.**

## Dersxana h'eyşta (72 sae't)

### Pêşgotin

Xwendek'ar dersxana heyştada gerekê karibin bi zimanê k'urdîyî wêjeyî (e'debî) bi xeberdana h'ewesk'arva cîvat û ç'îyêd mayînda pêjda bên. Xêncî wê yekê, xwendek'ar gerekê hertim qinyatê ku ro'jnamê k'urdîda têne neşirkirinê bixûnin, guh bidine ser xeberdana kanalê t'êlêvîzyonêd k'urdîye «Mêzopotamya», «Zagros», «R'oj TV», «K'urdistan TV», «K'urd sat», «R'ojhelat TV». Derheqa tiştêd xwendîda û dîtîda bi celebekî bedew û bê şaşî deft'era xweda binivîsin. Xwendek'ar gerekê karibin ûsa jî serhatîya, miqala û nema binivîsin. Têkstada ew gerekê hevokêd giranbar, k'omêd hevokêye li hevhatinê bivînin û rast nivîsandinê zanibin.

### Gramatîka - (36 sae't)

1. Zemanên lêkeran (dûmayî). (10 sae't).
2. P'arên hevokêye sereke (10 sae't).
3. P'arên hevokêye duemîn. (16 sae't).

### Mijarê bona qisekirinê û e'debîyata k'urdî (36 sae't)

1. Ba ku ha bê, qe tiştekî...
2. Bizina pîrê. Zebeş.
3. Qanatê K'urdo.
4. Selman li k'itêbxanê. Ji bona xwe dibezim.
5. Nîzamî Gencevî.
6. Li mûzêya Almatê.
7. Nimêja melle.
8. Pîrêmêrd. "Newroz"
9. Kevanîya malê. Helbestên zarokan.
10. E'bdulla Goran. "Jin".
11. Barîyê Bala «Kurê min».
12. Cegerxwîn. "Ziman û hînkirina zimîn".
13. K'urdistana min ka...
14. Zargotina k'urda. Helbestên zarokan.
15. Şîret û t'ema kalê.
16. Bêk'es.
17. Bajarê Kerkûkê.
18. Nadirê K'erem Nadirov.

**Dersxana neha (72 sae't)**
**Pêşgotin**

Xwendek'arê dersxana IX gerekê bikaribin berhemên e'debîyatê (wêjeyê); çiroka, serhatîya, dastana, r'omanên nivîsk'ar û helbestvanê k'urda serbest bixûnin, qisekin û derheqa wanda berxwenivîsarê (înşa, сочинение) fikirê xweye lêkolînî binivîsin. Ûsa jî lazime ewana parçêd helbest, poyêmêd şaîrê qazaxa û k'urda yê derheqa cejin, şayê dewleta Qazaxistane û k'urdada ezber bizanibin. Xêncî wêya ji lazime xwendek'ar tev olîmpîadê (pêşbirkêd) neh'îya û herême bivin. Bona wê jî barê giran dik'eve ser milê terbîyedara û dersdara. Lazime ewana zaroka baş hînkin.

Xwendek'ar gerekê r'ojname û kovarê e'debî û sîyasî bixûnin ku r'uh'ê wanda welatparêzîya Qazaxistanê û gelê k'urd çêbe. Dersdarê zimanê k'urdî be'sa dostî û biratîya k'urd û qazaxada ç'ivîn, şevberkêd çandî û hunerî gotî derbazke. Ûsa jî lazime ku dersdar zû-zû şevberkêd poyêzîyayê teşkîl bikin. Dersdarê zimanê k'urdî wexta dersê guhdarîke mezin gerek bide ser zanebûn û e'mrê zarokan. Sal bi sal zanebûna xwendek'ara alîê hînbûna zimînda zêde û k'ûr dibe. Zarok derheqa gramatîkaêda îdî êp'êce zanebûna dest tînin. Lazime ku dersdarê zimanê k'urdî careke din jî zanebûna xwendek'ara bi curê pirs û cawa kontrol bike.

**Mesele: fonêtîka (sewtzanistî) çîye?**
**Sewtêd dengdar k'îjanin?**
**Morfologîya (formzanîn) çîye?**
**Xeber cawa çêdibin?**

*Paşpirtik û pêşpirtik çîne?*
**Sîntaksîs k'îjan ulme û çi hîn dike?**
**Hevok çîye? Curê hevokê k'îjanin?**

Lazime ku dersdar derheqa e'debîyata k'urdaye zargotî zanebûna zarokan k'ur bike, be'sa janirê zargotina k'urdada me'lûmatîyê bide wan. Di k'oma IX zarok gerek çîrok, serpêhatî (serhatî), pêkenok, têderxistinok, zû-zûgotinok, k'ilam, destana hînbin, wana şirove bikin. Xwendek'ar gerekê êpos û poyêmê k'urdaye dîrokî **(E'vdalê Zeynikê, Xecê û Sîyabend, Ker û K'ulikê Silêmanê Silivî, Mem û Zînê, Zembîlfiroş)** hînbin. Dersxana IX guhdarîke mezin em didine ser e'mr û jîyana navdarên k'urd- Selahedîn Eyûbî, Şêx Se'yîd, Şêx Meh'mûd Berzancî, Şeref xan Bidlîsî, Îsmaîl axa Simko, Mustefa Barzanî, Eyşê Şana K'urd, Meh'med Arif Cezrawî û yên din.

Usa jî lazime zarokan hînî berhemên e'debîyata cîhanê bikin. Vira armanc ne ewe ku t'enê zarokan wan k'esanra bikin nas, lê mesela girîng ewe ku xwendek'ar bi zimanê dê karibin e'mir, jîyan û efirandinê wan navdaran hînbin û bie'limînin. Pirsa here sereke ewe ku xwendek'ar çend salada hînî ziman û edebîyata k'urdî bûne wan zanebûnê xwe çareke dîn jî biweklînin û dubarekin. K'itêbêda em rastî gele xeber û t'êrmînên edebî tên ewana bona

xwendek'ara hinekî çetin têne femkirinê. Ewa vê yekêra girêdayîye ku zimanê k'urdî hela hê wek curekî yekanî nehatîye qebûlkirinê. Lema jî li ber wan astengîyanda dawîya kitêbêda ferhenga (zimannama) giramatîkayê bi k'urdî- ûrisî hatîye danê. Dema xandina her beşekê, wexta r'astî xeberê nenas têne, lazime em alîkarîyê ji ferhengê bistînin.

Çawa ku em zanin gelek heremên K'urdistanêda û gele meyî devrayî welêt nolî hev na axive, axavtin û dîalêkta wan cûda-cûdaye.

P'iranîya zarok hê e'mrê xweyî berî dibistanêda zimanê dê zanin, malda bi zimanê dê diaxivin, hine cîya salê dibistanêda hîn dibin, kêm zanin, hinek jî bi alîk'arîya p'irtûk û mamosteya hîn dibin. Ewa jî şertekî mezine wexta hînkirina zimanê k'urdî, gotî dersdar guhdarîke mezin bide ser vê pirsê. Bi cûrê fe'mdarîyê nêzîkî wan bê. Zanebûna wan alîyê zimanda hilde h'esab. Yê ku ziman baş nizanin wanr'a cuda mijûlbe. Vira armanca mezin ewe ku xwendek'ar bikaribin bi hevra biaxivin, pirs û cawa bidin hev, perçêd xwendinê bixûnin û me'na wan fem bikin. Vê derecêda îlahî zarok wan têkstên p'irtûkêda bixûnin, şêra ezber bikin, carna jî serecema wan bi gilîyê xweva şirove bikin, têksta bi deng bixûnin.

Zimanê k'urdîda çar zaravê (dîyalektê) mezin hene, ewana evin: **kurmançî, soranî, goranî û zazakî (dimilî)**. Xêncî van dîyalêktê mezin dîyalektê biçûk jî hene. Lazime ku dersdarê zimanê k'urdî zarokan hînî zimanê edebî bike, nava axavtina wanda xeberê beyanî (yê ji zimanê din derbazbûyî) bide kêmkirinê, dewsa wan pêyvê k'urdî bi k'ar bîne.

Rêzimanî - (36 sae't)

1. **Fonêtîka.**
2. **Sewtên dengêr.**
3. **Sewtên dengdar.**
4. **Bang.**
5. **Derbdayîn.**
6. **P'arên xeberdanê.**
7. **Hevok.**
8. **Hevokên kurt (sade).**
9. **Hevokên bargiranî( r'êzik).**
10. **Endame hevokêye sereke.**
11. **Endame hevokêye duemîn.**

## Mijarên bona qisekirinê, edebîyata k'urdî û cîhanê (36 sae't)

1. Klasîkê wêjeya Almana.
2. Zargotina k'urda
3. Hejar «Her k'urdim».

4. Hevaltîya rûvîyê çolê û rûvîyê deştê.
5. Celadet Bedirxan.
6. Hecîyê Cindî.
7. Ji folklora cimaetê.
8. Dîrok û e'debîyata me.
9. Xecê û Sîyabend.
10. ehlûlê Zane.
11. Sîr û pîvaz.
12. Meselê gelê k'urd.
13. Wezîrê Nadirî «Kilama min».
14. Şîretê dê û bavan.
15. Mûsa Enter.
16. Legleg û rûvî.
17. Dîrok, çand û e'debîyata xwe hînbin.
18. Ker û K'ulikê Silêmanê Silivî.
19. E'vdalê Zeynikê.
20. Şeref xan Bidlîsî.
21. Baba Tahîr.
22. M. M. Barzanî.
23. Mah Şeref Xanim K'urdîstanî.
24. Mehmed Arifê Cizrawî.
25. Eyşê Şana K'urd.
26. Xaçatûr Abovyan.
27. Batirê Qazaxistanê.
28. H'evt qanûnnamê Teûkê Xane e'sasî.
29. Aytêkê bî.
30. Tolê bî.
31. Qazibêk bî.

Dersxana nehada xwendek'ar xêncî zanebûnê nuh, usa ji zanebûnê ku salê buhurîda sitandî diwek'ilînin. Bi vê mijarêva hînbûn û zanebûna wane di alîye zimanê dêda hê zêde û qewîn dibe.

Nav û nîşanên cavkanîêd ku me jê qinyat hildanê
(Список использованной литературы)

1. Balî Awê. Alfabeya k'urdî.- "K'omkar".- 1982. (kurmancî).
2. Qanatê K'urdo. Zimanê K'urdî (rêziman). K'têba dersê bona k'omêd 3-4 a. Lûys. Êrêvan. 1979.
3. Bavê Nazê. Rêzimana zimanê k'urdî (zarawê kurmancî).- Ji bo sinifê III- VIII.- Weşanên "Axîna welat".- Moskova. 1996.
4. Wezîrê Nadirî. Zimannama kurmancî. –Yêrêvan. 1947.
5. Amed Tigrîs, Nasir Rezazî, Fahad Gardawan. Cografya K'urdistanê (ji bo pêngava navîn û bilind). Stokholm, 1993.
6. Kamûran Bedir xan, Kolay kurtçe (Kurmancî), Istanbûl, 2. Baski. DOZ. Basin-Yayin.ltd.1994.
7. Nurettin Karacadag. Zimanê K'urdî. Doguş matbacilik ve Tic.1991.
8. H. Cindî, E.E'vdal. Folklora kurmanca. –Êrêvan. -1936.
9. Programa. Zimanê K'urdî. Bona dersxanêd II-VIII. Hazirkirin: Tîtal Mûradov, Maksîmê Xemoî, Yêrêvan.1981.
10. Ладыженская А.Т. Детская риторика (Программы для общеобразовательных учреждений: начальные классы (1-4)).- Москва, Просвещение. - 1998.
11. Обязательный минимум содержание начального образования. Приказ министерства общего и профессионального образования Р.Ф. от 19.05.98. Требование к уровню подготовки обучающихся по русскому языку и литературному чтению (справочник руководителя и учителя начальной школы). Тула: Родничок. -1999.
12. Бондаренко А.А., Гуркова И.В. Учимся говорить правильно. - Новосибирск, 1993.
13. Новоторцева Н.В. Развитие речи детей. (Популярное пособие для родителей и педагогов).- Ярославль.- 1997.
14. Кедайтене Е.И.. Курдистан Мукриани. В.И.Митрохина. Учебный русско-курдский (словарь для изучающих русский язык). Москва, Русский язык. -1977.
15. Узорова О.В. Нефедова Е.А. Практическое пособие по развитию речи. – Москва, 1997.
16. Бакаев Ч.Х. Роль языковых контактов в развитии языка курдов СССР. - Москва, «Наука», 1977.
17. Цукерман И.И. Очерк курдской грамматики. - Москва, 1962.
18. Шамилов А.Ш. Латинизация курдского алфавита. «Заря Востока», 1929, №1928.

# Bername
# û mêtodîka hînbûna zimanê kurdî

*(Rêberîya mêtodîkîyê ji bo mamosteyên zimanê kurdî)*

**Bona dersxanê II-IX**

**Amedek'ar: Prof. dr. Knyazê Îbrahîm**

Отпечатано: 3.05.2006
Объем: 2,5
Формат: 60/84
Тираж: 100
Типография: государственная детская
библиотека С. Бегалина
пр. Достык 15

# PDF:

# Enstîtuya Kurdî ya Qefqasyayê

Web:
https://www.ensiklopediyakurdi.com/

Tel.:
+7 918 073 48 79